



KMR



*Zarokê ku ji bû wergirtina
parastina navnetewî
daxwazê pêşkêş diken.*

Zanyarî ji bo zarokê bê xwedî ku , li gor madeya 4 ji destorên (Yekîtiya Ewropayê) bi jmareya 604/2013 daxwazkerên parastina navnetyewî ne.

Ew belavoka zanyarîya ji were hatîye pêşkêş kirin ji ber ku we ragahîandiye ku we pêdvî bi parastina navnetewî heye û temenê we bin 18 sala ne. Eger temenê we bin 18 sala be hûn zarok têne hesbandin. Herwesa gengaze ku berpris we "kêmsal" binav biken , ku bi wateya zarok ye. "Rayedar" ew kesin ku berpîrsîya biryargirtin li ser daxwaz we ya parastinê li ser milê wane.

Eger hûn di welatê xwe da ji tiştêk ditirsyan û bi vê sedemê lêre da do parastina navnetewî digerên, em we "penaber" binav diken . Penage cheke ku livê parastin û ewlehî heye.

Dema ku hûn daxwazek fermî ji rayedara re dişînin û di navda daxwaz penaberîyê diken zagona ew daxwaze "daxwaz/ daxwaza parastina navnetewî" binav diket. Kesê ku daxwaza parastinê diket, "daxwazker" tê nas kirin Hindhek caran hûn "penaber" tên binavkirin.

Dîbavê we divê gek we bin, lê eger ew nebin yan eger hûn rê da ji wan veqetyane, hûn **'zaroke bê xwedî'** ne.

Li vê demê da, emê "nûner", kesek mezinsal ku di d vê proseyê da tê harîkarya we biket, ji were dabîn biken Ew tê di berhevkirina daxwaznamê harîkarya we biket û dişêt dema ku pêdivye hûn gel berpîrsan baxvin, gel we bêt. Hûn dişên li ser arêşe û tîrsên xwe gel nûnerê xwe baxvin. Nûnerê we livê ye daku msoger be ku berijwendiyê we serekî ne, bi gotineka di pêdvî, ewlehî, saxlemî, mezinibûna civakî û gotinên we serdestin. Herwisa nûnerê we gengazya têkel bûna gel xîzanî li ber çava digrît .


Ev belavoka zanyarîyan tenê ji bo agadariya we dê pêşkêş kirin. Em bi pêşkêş kirina ev belavokê dixwazin ku zanyaryên Iser proseya Dublinê ji daxwazkerên parastina navnetewî re pêşkêş biken. Ev belavoke bi serê xwe çî maf û berpîrsyarya yasayî çê nake /liber negerît. Maf û berpîrsyariyên dewlet û şexsên bin proseya Dublinê li yasayên (Yekîtiya Ewropayê) 604/2013 da hatine tomar kirin.

©Yekîtiya Ewropayê 2014

Blavkirin bê kêşeye. Ji bo her çêşît bikaranîn yan çapkirina wêneyên şexsî, divê yekser ji xwedyê mafê bikavkirinê izin bê standin.



Welatên Dublîn pêk tên ji 28 welatên endamên Yekîtiya Ewropayê (Hingarya (AT), Belcîka (BE), Bilxarya (BiG), Kirwatîya (HiR), Qibris (CiY), Komara çikê (CiZ), Danîmarka (DiK), Estunya (ET), Fenlanda (FI), Fransa (FiR), Elmanya (DE), Yewnan (EL), Mear (HU), Îrlenda (IE), Îtalya (IT), Letûniya (LiV), Lîtwanîya (LiT), Lûksemborg (LU), Malt (MiT), Holenda (NiL), Polonya (PiL), Pirteqal (PiT), romanya (RO), silwakî (SiK), slûni (SI), Spenî (ES), Swed (SE), Iniglîz (UK)) Venis 4 welat "grêdayî" be yasayên Dublîn (Norwec (NO), Îslend (IS), Swîsre (CiH) û Lêxtînştan (LI)).



Eger gel mijarek balkeş hember bûn, ji kerema xwe ji nûnerê xwe yan berpîrsa bipîrsin daku ew harîkarya we biken!

Tevî ku vî welatî da we daxwaz penaberiyê kirîye, gengaze ku welateka dîke daxwaza penaberya we vekolînit.

Tenê welatek divêe berpîrsê lêkolîna daxwaza we ya parastina navnetewî. Ew mjare di zagonayek binavê 'Zagona Dublînê ' **hatîye tomar kirin** Ew zagonaye me mecbûr diket ku em dîyar biken ku em berpîrsê lêkolîna daxwaz we ne anku ew berpîrsyarîye li ser milê welatek dî ye – em ji vê pêvajoyê re "Proseya Dublînê" dibêjin

Zagonayên Dublîn li seranserê heremek cixrafi ku ji 32 welatan pêk dê, bcî divê¹⁾. Di vê belavokê da em ji wan 32 welatane, welatên Dublîn dibêjin.

Ji destê rayedara nerevin yan neçine welatek di yê Dublînê. Gengaze hindek kes ji were bêjin ku ewe baştirîn kiriyare ku hûn dişên biken. Eger kesekê ji were pêşnyara revînê kir, yan ji were got ku gel me wern, bi lez ew mjarê jinûnerê xwe anku rayedarê dewletê re rabigehîne.

Ji kerema xwe bi lez rayedarê dewletê re rabigehîne eger :

- *Hûn tinê ne, û wsa difkirin ku dayîk, bav, bira /xweşik, xaltîk/met²⁾, mam/xal³⁾, dapîr ya bapîrê we gengaze li yek ji 32 welatên Dublîn , ku di nexşeya laper 3ê; da hatine nîşan dan, da bin.*
- *Li vê demê, hûn hez diken ku digel wan bijîn yan ne;*
- *Gel kesek di hatine nava vî welatî û, li vê demê , gel kê;*
- *Li nêz da nav welatek dike ji 32 "welatên Dublînê" ku hatine list kirin, da bûne;*
- *Di yek ji welatên Dublîn da şopa tilîyên we hatiye wergirtin: da şopa tilîyê wîneyeke ku ji tilîyan dête grin daku harîkarya pêvajoya naskirîna biket;*
- *Niha we li yek ji welatên Dublîn da daxwaza penaberiyê kirîye.*

Gelek gringe ku hûn harîkarya rayedarê dewletê biken û herdem ji wan re rastyê bêjin.

Eger li dema pêşkêş kirina daxwaza penaberiyê hûn ji dêbavê xwe veqetyane, sîstema Dublînê dişêt ji were harîkarî bidet.

Eger me liser dêbav yan xêzana we agahiyên baş hebin, emê di welatên Dublînê da do ewan bigerên. Eger em ewan peyda biken, emê bxebtin daku we bigehişne welatê ku dêbav yan xizmê we livê da akencî ne. Paşê ew welat tê bibe berpîrsê lêkolîna daxwaz we ya parastinê.

1) **Nexşeyeke wan welatane di laper 3ê da hatiye**
2) **Xwûşika dayîk ya xweşka bavê we**
3) **Birayê dayîk ya birayê bavê we**

Eger hûn tinî ne û we çî malbat yan qewmek di yek ji welatên Dublîn da nîne, bi gengazya zêde daxwaza we her di vî welatî da bête vekolandin.

Gengaze em bixwazin ku daxwaza we di lêre da binirxînin, heta eger gor zagonayê welatek dî berpirsê vekolîna daxwaza we be. Em dişên vê kiryarê bi hecetên mirovxazane, malbatî yan koltorî biken.

Di nava vê proseyê da, **em herdem berijwendiyê we serdest didanên**, , em we naşîne welatekê ku livê da mafê we yê mirovî bête binpêkirin.

Eve ku em hertim **in li gor berijwendiyê** we dxebtin bi ç wateyeke? Ew anî ku em:

- Gingazya vê hindê vebikolînin ku em we bizivrînen bal malbata we li hemen welatî da.
- Piştrast bin ku hûn di bardoxek ewle dane, bi taybet li hember kesên ku gengaze gel we kiryarek xrab hebin/ ji were zyanê bigehînin;
- Piştrast bin ku hûn dişên di bardoxeka ewle û saxlem da mezin bin, û ji hêla xwarn û starê de bêxem bin û pêdvên peywendî dar bi geşbûna xwe ya civakî bidest bînin;
- Guhdarya gotinên we dîken - bo mînak, ma hûn dixwazin bal yek ji xizmên xwe bmînin yan dixwazin vê şolê neken.



Temenê we

Kesên ku temenê wan ji 18 salan mezintire "mezinsal" tên hesbandin Gel ewan kesane bi şêweyêke cuda ji zarokan û kêmtir salan ("kêmtir temen") kiryar tê kirin.

Ji kerema xwe temenê xwe yê rast bêje.

Eger we belgeyek heye ku temenê we nîşan bidet, vê pêşkêşî rayedara biken. Eger rayedar bixwazin ku temenê we bizanin, gengaze ku nijdarek we taqî biket daku bizane ku temenê we ji 18 salan kêmtir yan zêdetire. Pêş her taqîyek nijdarî divê hûn/ anku nûnerên we gel vê rezamendîya we hebe.

LÌ ÇEND RÊZÊN XWAR DA EM DÎXWAZÎN EWE PÎRSÊN HERÎ ZÊDE LÎSER PROSEYA DUBLÎNÊ , Û VÊ ÎKÊ KU ÇAWA EW PROSEYE DÎŞÊT HARÎKARYA WE BÎKET Û DÎVÊ HÛN ÇAVRÊYÊ ÇI BÛYEREKÊ BÎN, BERSÎV BÎDEN:

Şopa tilîya – çi ne? Çima şopa tilîya divê ji min bête girtin?

Dema ku hûn daxwaza penaberiyê diden, eger temnê we ji 14 salan zêde be, wîneyek yan resmek ji tilîyên we (binavê "şopa tilîya") bê girtin û şopa tilîyên we di binkeyek bi navê "Eurodak" da tê bête tomar kirin. Divê ku hûn di vê pêvajoyê da harîkarî biken- hûn ji aliyê zagonayê da berpresin ku şopa tilîyên xwe pêşkêş biken.

Gengaze hindêk caran şopa tilîyên we bê te lêkolîn kirin heta bête zelal kirin ku pêştir we daxwaz kirîye yan aya pêştir li ser sinor şopa tilîyên we hatiye tomar kirin yan ne. Eger bê dîyar kirin ku we li nêz ji yek ji welatên Dublînê daxwaza penaberîyê kirîye, eger çûna we ji vî welatî re bi mfa ya we be, gengaze hûn ji vî welatî re bête veguhestin. Paşê ew welat tê bibe berpîrsê lêkolîna daxwaz we ya parastinê.

Şopa tilîyên we bo 10 salan dête tomar kirin Paş 10 sala, ew bi xwe tê ji binkeya agahîyan bêne paqij kirin. Eger ji pêşkêş kirina daxwaza parastina navnetewî da hûn serketî bin, şopa tilîyên we di vê binkeyê da tê bminît heta ku bxwe tê paqijkirin. Eger hûn bibine hevwehatê dewletek Dublînê, di vê demê da tê şopa tilîyên we bête paqij kirin. Şopa tilîyên we û regeza we tê Eurodakê da bête tomar kirin - nav ,wîne, rojbûn û neteweya we li binkeya agahîyan da tomar nabe Lê gengaze ku li yek ji binkeyên agahîên netewî bête tomar kirin. Agahîên tomakirî di Eurodakê da nakevîte ber destê welat anku sazyên derweyê welatên Dublînê.

Ji 20ê Julaya 2015ê da, rayedar wek polîs û navenda polîsên ewropa (Europol) dişên şopa tilîyên we binirxînin; ew kesane dişên ji bo bidest anîna agahîyên Eurodakê bi mebesta bergirî, naskirin, û lêkolîn li ser tawanên mezin û terorîsmê daxwaz biken.





Divê ez piştras bim ku çi agahîyên li ser bardoxa min li destê berpirsan da hene?

Gengaze hevpeyvînek gel we bête kirin heta ku em bşên li ser bijartina welatê ku berpris be liser lêkolîna daxwaz we biryara xwe bigrin. Di nava ew hevpeyvînê da, emê "Proseya Dublînê" ji were zelal biken û gingazya vê hindê vebikolînin ku em we bzivrînen bal malbata we li welatek dî yê Dublînê da

Eger hûn dizanin ku dêbav, xwûşik û birayê yan qewmek we li welateke dî yê Dublîn da akencî, ji kerema xwe ew mjarê ji kesê ku gel we hevpeyuynê pêk tîne rabigehînin. Daku gengaze ji me re agahîyên zêdetir pêşkêş biken, wek nav, nîşanî, jmare telefon û hwd, ew zanyariyane li peydakirina malbata we da tê harîkaryar me biken.

Li maweya hevpeyvînê, gengaze ji we bête pirsîn ku heta niha hûn hatine nava welatek dî yê Dublînê yan na. Ji kerhma xwe rastyê bêjin.

Nûnerê we dişê di hevpeyvînê da gel we be, daku harîkarî û piştgirya pêdvî ji we re biket. Eger bi hecetek hûn naxwazin nûnerê we di hevpeyvînê da gel we be, divê ew hecetê ji rayedarê welat rabigehînin .

LÎ DESTÎPÊKA HEVPEYUYNÊ, HEVPEYVÎNKER Û NÛNERÊ WE QONAX Û MAFÊ WE TÊ JI WERE BECÎS BIKEN. EGER JI MJAREKÊ TÊ NAGAHÎJIN, YAN PIRSEKA WE HEBE, JI KEREMA XWE JI WAN BIPRISIN!

Hevpeyvîn mafê weye û yek ji pişkên gring li proseya daxwaza we dête hesbandin.

Hevpeyvîn bi zmanê ku hûn tê digehîjin tê pêk bêt. Eger hûn ji ezmanê ku dête bikaranîn tê nagahîjin, dişên daxwaza wergêrê devekî biken heta ku di peywendî girtinê da arîkarîya we biket. Wergêrê devekî divê tinê gotinê we û hevpeyvînkê werbigrêt. Wergêrê devekî nabe gotinê xwe ji gotinê were zêde biket. Eger hûn ji ezmanê wergêrê devekî tê nagahîjin, divê me agadar biken / anku gel parêzerên xwe baxvin.

Ew hevpeyvîne tê nehîni bminît. Bi gotinek dîke, çî agahîyên ku hûn pêşkêş diken, wekî daxwaza penaberîya we, ji xelk anku berpîrsên welatê we ku gengaze bi her şêweyekê ji we anku endamê malbata we ku hêsta nav welat da ne, zrar bigehîne, nayêne pêşkêş kirin.

DIVÊ HÛN Û NÛNERÊ WE LÎ ÇARÇÛWEYA MAWEYA PROSEYA DUBLÎNÊ AGADAR BÎN!

Çi maweyek dikêşîne heta ku hûn bzanin ku divê hûn biçne welatek dî anku dişên lêre da bmînin?

Eger berpirsyaretya biryardan li ser daxwaz penaberîya min bikewe ser milê welat dî, tê çi biqewme?

→ Eger bo cara êkê ye ku di welatên Dublinê da we daxwaza penaberî kirîye, hûnê ji welayek dî re bèn veguhestin ji ber ku dayîk , bav, bira, xwûşik , met/xaltîk, mam/xal, dapîr ya bapîrê we li vî welaatî dane e hûn jî tê livê da têkelî ewan bin û li maweya lêkolîna daxwaz penaberiyê hûnê bal wan.⁴⁾

→ Eger lêre da we daxwaza penaberiyê nekiribe li pêştir li yek ji welatên Dublinê da ji bo weregirtina penaberiyê we daxwaz pêşkêş kirbe, gengaze hûn ji vî welatî re bin veguhestin heta ku rayedar livê da daxwaza penaberîya we vekolînin.⁵⁾

Di her her rewşekê da gengaze ku biryara girtin li ser veguhistina we ji welatek dî herî zêde pênc mehan bikşîne, çi dema ku we xwe daxwaza penaberiyê kirbe yan dema ku daxwaza paristina navnetewî ya ji yek ji welatên dipblînê bigehîje destê me. Paş biryargirtinê, rayedar bilez tê we ji biryarê agadar biken.

→ Lê belê eger we ji bo penaberiyê di vî welatî da daxwaz pêşkêş nekiribe û encama daxwaza penaberîya we ya pêş bi biryarek dawî hatbe retkirinê dişên bi şandna daxwazek ji welatê berpris bixwazin, ku we bzivrinît, yan pêdvê wegerandna we ji bo welatê we yê serkî anku akencî bûn di welatek ewlee yê sêym da pêk bîne.

Eger em bigehîşîne ew encamê ku, berpirsyaretiya vekolîna daxwaz penaberîya we bikewe ser milê welatek dî, paş ku vî welatî ew berpirsye pejrând, emê bi fermî ji were rabigehînin ku em daxwaza we ya parastina navnetewî navekolînin û di şona vê da emê we ji welatê berpris re bşînin.

4) Gengaze ew proseye ji aliyê xelkê "pejirandina berpirsyaretyê " bê binav kirin.

5) Gengaze ew proseye ji aliyê xelkê "vezivirandin" bê binav kirin.

Şandina we di navbera 6 heyvan ji roja qebûl kirina berpirsyê ji aliyê welatek dî we ,yan eger hûn bixwazin ji vê biryarê re gazinde bin, di navbera 6 heyvan ji dema ku biryara dawî li ser daxwaz we ya venêrînê bê tomar kirin, tê pêk bê. (Serdana pişka xwar bike ku ew proseyê zelal dike!). Eger lêre da hûn hatbine girtin, gengaze ku ew deme heta salek yan eger birevin ew deme heta 18 heyvan tê drêjtir be.



©iStockphoto / Joe Gough

"Eger ez biryar veguhestina xwe ji welat dî re qebûl nekem, tê çi biqewme?"

Li ser ew mjarê gel nûnerê xwe biaxvin!

Eger em biryarê bigrin ku divê hûn ji welatek dî re bêne veguhestin heta ku daxwaza penaberya we livê da bête vekolîn kirin û hûn ew biryarê qebûl nekeyn, hûn dişên nerazî bûna xwe dij bi veguhestina xwe ji welatek dî re rabigehînin. Ji vê kiryarê re "daxwaza nêrîna dûbare" yan "venêrîn" tê gotin.

Paş wergirtina biriyara fermî ya veguheztina xwe ji alê berpirsan we, 21 roja derfeta we heye ku bal dadgeha rêveberî daxwazeka venêrînê pêşkêş biken. Gelek gringe ku li dema hatî diyarkirî da daxwaz venêrîn xwe pêşkêş biken. Nûnerê we divê li ew mjarê da harîkarya we bike.

- We (7) roja derfet heye ku ji bo paşxistina veguhestina xwe di maweya lêkolîna daxwaza venêrîna xwe daxwaz biden. Dozgerî anku dadgeha navnetewî di maweyek kirt da liser ew daxwazê tê biryara bigrît. Eger paşxistin nehate pejrandin, hecetên vê tê ji we re bêne zelal kirin.
- Li piştta ew belavokê agahîin berpirsê peywendî dar ku divê bo daxwaz venêrînê li ser biryara hatî birîn di vî welatî da serdan wan biken, hatine.

Li maweya proseya "daxwaza venêrîna", hûnê harîkarya zagonî û, eger pêdvî be, harîkarya ezmanî werbigrin. Eger hûn neşîn xercê parêzer biden, dişên ji bo wergirtina harîkarya zagonî ya bêlaş daxwaz biden. Di piştta vê belavokê da agahîyên li ser rêkxistinn ku harîkariyên zagonî pêşkêş diken, û dişên li maweya proseya "daxwaz venêrînê" harîkarya we biken, hatine.

Destbiserî

Dête gotin kesin ku bi serxwe neşên li her alyekê ve bçin û di avahîyeka dergirtî da akencî ne û nikarin vê terj biken, hatine "destbiser" kirin.

Eger hûn zarokek bê xwedîne, gengaze ku li binkeyek da eknicî bibin ku zagonayên taybet bi xwe hebin, bo mînak nabe şew yan dema hewa tarye li derweyê binkeyê bmînin, yan zagonayên ku we mecbûr diken ku dema hat û çûna xwe li nûnerê xwe re. Ew Zagonane jbo parastina we û ewlehya we hatine tomarkirin. Ev astengîyene ne bi wateya destbiserkirina wene.

LÎ RAST DA ZAROK ÇÛ CARAN NAYÊN DESTBISER KIRÎN!

Hûn hatine destbiser kirin? Egerhûn nzanin ku hûn hatine destbiser kirin, ya na ji kerema xwe bilez gel rayedar, nûnerê xwe anku rabêjkarê xwe yê zagonî ⁶⁾ biaxive. Paşî hûn dişên li ser rewşa xwe û gengazya gazinde bûn li ser biryara girtina xwe gel ewan baxvin!

Gengaze ku hûn li maweya pruseya Dublînê bêm girtin. Li gelek caran, demekê ew bûyer pêk dê ku rayedarê parêzgejhê agadar bin ku temenê we ser 18 salana û dlingeranin ku hûn dixwazin birevin yan xwe ji ewan weşêrn ji ber ku hûn naxwazin ji welatek dî yê Dublîn re bèn veguhestin.

Mafê weye ku bi nivîskî ji sedema girtina xwe û şêweya gazinde bûn li ser biryara girtina xwe agadar bin. Herwisa eger hûn bixwazin li ser biryara girtina xwe gazinde bin, mavê we ye ku harîkarya zagonî werbigrin; li ber vê eger hûn nerazî ne gel nûner yan rabêjê xwe yê zagonî baxvin.

Eger li maweya proseya Dublînê da hûn hatine girtin, çarçuweya dema proseyê ji were tê bi rewşa jêr bibe: em mecbûrin ji welatê dî bixwazin ku di navber a ma **yek heyvê** roja pêşkêş kirina daxwazinameya xwe ya

6) **Kesê ku ji aliyê rayedaran we wek nûnerê berjewendî we bal qanunê dête nasîn. Nûnerê we û/ yan rayedar divê li dema pêdvî ji were rabêj biden, lê hûn ji dişên ji wan bixwazin ku ji were hindek pêşnyara biken. Agahîyên li ser rêkxistinn ku dişên nûnerê zagonî ji were pêşkêş biken li piştta vê belavokê da hatine.**

penaberiye berpirsyaretya lêkolîna dûsyeya we qebûl biket. Welatê ku daxwaz we jê re tê şandin, divê di navbera **du hefta** berisva me bide. Li domahyê, eger hûn destbiser bminin, veguhestina we divê di navbera **şêş hefta** ji dema pejranda daxwazê ji aliyê welatê berpris we pêk bê.

Eger dema ku hûn hatine destbiser kirin, hûn bixwazin ji vê biryarê re gazinde bin, rayedarên parêzgehê heta şêş heyvan neşên we bşînin. Rayedarên parêzgehê tê we ji bijarên berdest bihesbînin.

Eger rayedarên parêzgehê nikarin derfetên diyarkirî ji bo daxwaz kirin ji welatek dî ji bo qebûlkirina berpirsya daxwaza we pêk bînin anku veguhestina we ji bo welatek dî li derfetên diyarkirî da çê nebû, girtina we ku bi mebesta veguhestina we û li gor zagonayên Dublînê pêk hatîye tê bidawî bibe. Li vê demê , sinorên zemanê yê asa ku li ropela 11 behsa wan hate kirin, tê bêne cî beci kirin.





Li maweya ku em li ser dîyarkirina dewleta berpris biryar digrin, tê çi mafê we hebe?

Eger em bigehîşine ew encamê ku, berpirsyaretya biryardan li ser daxwaz penaberya we ser milê me ye, we mafê rûniştinê di ev welatî da heye. Eger berpirsyaretya biryardan li ser daxwaz penaberya we bikeve ser milê welatek dî, heta dema veguhestinê, we mafê rûniştinê di ev welatî da heye. Eger welatê ku hûn niha lê akencî ne bibe berpîrsê lêkolîna daxwaza penabera we, herî kêr heta maweya ku biryara destipêkî li ser daxwaza penaberya we dête birîn, hûn dişîn di vî welatî da bminin. Herwisa we we mafê qazanc wergirtin ji pêdvê jyanê, bo minak avahî, madeyên xwarnê û hwd, û herwisa parastinên saxlemyê yê destipêkî û harîkarya tengavya saxlemyê heye. Herwesa hûn dişên biçîne dibistanê.

Ji were derfet tê dayîn ko agahiyên li ser rewşa xwe û akincî bûna malbata xwe li welatên Dublînê da bi rewşa devekî /yan nivîskî ji mere rabgehînin û, di vî mjarê da, ezmanê xwe yê zikmakî anku ezmanên ku hûn tê digehîjn bikar binin (yan di dema pêdivî da wergêrê devekî bikarbinin). Herwisa rûnivîseka nivîskî ji biryara veguheztina xwe ji bo welatek dî tê ji were bê pêşkêş krin. Herwisa hûn dişên ji bo bidest anîna agahiyên zêdetir gel me pêwendyê bigrin û/yan gel Rêveberîya Komîsyona Blinda Penaberan ya Neteweyê Yekbûyî (UNHCR) di vî welatî da pêwendiyê bigirin.

Nûnerê we û rayedarên parêzgehê sebarek bi mavê we tê ji were agahiyên ptir pêşkêş biken!

Agahîin şexsî ku min pêşkêş kirne, tê çi lê bèn? Çawa ez agahîdar bim ku ew agahîî bi rewşa xrab nayên bikar anîn?

Berpîrsên welatên Dublîn dişên agahîên ku we li maweya proseya Dublînê da pêşkêş kirne tinê ji bo pêkanîna berpîrsyarîyên xwe li gor zagonayên Dublîn û Eurodakê gel hew dest bidest biken.

We tê mafê bikaranîna mjarên jêr hebe:

- Agahîyên li ser xwe. Hûn dişên ji bo agahîyên xwe bi taybet zanyarîyên Eurodakê li dema şaş bûna wan û paqijkirina wan li dema ku bi nazagonî hatbine ku kirin, daxwazekê pêşkêş biken;
- Agahîyên ku çawanya hemuwar kirin anku paqijkirina agahîên we zelal diken, bi taybet zanyarîyên peywendî gel berpîrsên peywendîdar ku berpîrsyaretya lêkolîn li ser proseya Dublînê li ser milê wane, zanyarîyên berpîrsên netewî yê parastina agahîyan ku berpîrsê bersiv dana daxwazên taybet bi parastina agahîên şexsî ne.

Li kû ez dikarim şîreta werbigirim

Zanyariyên nişanî û pewendya gel berpîrsê penaberan

Maahanmuuttovirasto (Xizmeta Koçberîya Fenlandê)
PL 18, 00581 Helsinki
+ 358 295 419 600
Jimareya xizmetê bo ev mijarê:
+ 358 295 419 627,
Sêşem–Pêncşem 10–11
www.migri.fi

Nûnerê kesê kêmsalê yê bêxwedî

Dadgeha heremî bo kesê kêmsalê yê bêxwedî ku daxwaza penaberîyê pêşkêş dike, nûnerêkê dîyar dike. Navenda pejirandinê tê daxwaza nûnerî pêşkêş dadgeha heremî bike.

Parastina zaroakn

Navenda pejirandinê berpîrsê ku tevahîya derfetê refaha civakî ku bo saxlemî û geşbûna zarokê pêwîstin bi alîkarîya alîkarê civakî yê dosiyê dabîn bike. Eger li ser ev babetê pîrsêk we hebe, gel alîkarê civakîyê rûniştîyê di navenda pejirandinê da pêwendîyê bigirin.

Berpîrsê cî becî kirina proseya Dublinê;

Xizmeta Koçberîya Fînlenda yê (Maahanmuuttovirasto)

Agahîyên pêwendîyê di beşa jorî da hatine pêşkêş kirin.

Agahîyên Rêveberîya Netewî ya Çavdêriyê (Parastina Agahîyan)

Tietosuojaalvautetun toimisto (Navenda Lêkolîna Parastina Agahîyan)
PL 800, 00521 Helsinki
+ 358 295 666 700
Xizmeta ragehandinê:
+358 295 616 670,
Dûşem–Pêncşem 9–11 û 13–15,
Înê 9–12
tietosuoja@om.fi
www.tietosuoja.fi

Nasnameya Kontrolkerê Eurodac û nûnerê wê/wî

Navendên pêwendîyê: Civata Netewîya Polîsî (Poliisihallitus) û Xizmetên Koçberîya Fenlanda (Maahanmuuttovirasto)

Agahîyên Pêwendîya Rêveberîya Kontrolker

+ 358 295 480 181
Poliisihallitus (Civata Netewîya Polîsî)
PL 22, 00521 Helsinki
kirjaamo.poliisihallitus@poliisi.fi

Maahanmuuttovirasto (Xizmetên Koçberîya Fenlanda)
PL 18, 00581 Helsinki
+358 295 419 600
Jimareya xizmetê bo ev mijarê:
+358 295 419 627,
Sêşem–Pêncşem 10–11
www.migri.fi

Eger hûn dixwazin agahîyên xwe ku li binkeya Eurodakê da hatine qeyd kirin, bibînin, daxwaza xwe bi destî pêşkêşî binkeya polîs biken. Li vê dibe belgeyên nasnameya xwe nîşan biden. Em pêşniyar diken ku serdana hemen binkeya polîs biken ku daxwaza penaberîya we pejirandîye. Agahîyên pêwendîya navendên xizmetên polîs di malpera polîs bi nîşaniya poliisi.fi da hatîye tomar kirin.

Suomen Punainen Risti (Xaça Sora Fînlanda yê)

Tehtaankatu 1 a
00140 Helsinki
+358 20 701 2000
info@redcross.fi
www.redcross.fi

Lêgerîna qewimên winda bûyî

Navendên pêşkêş kirina rabêjên zagonî û sazîyên alîkar

Hûn dikarin ji navendên rabêja zagonî û nevendên dî yê

pêşkêşkerê xizmetên zagonî û parêzî ku daxwaza xwe bo pêşkêş kirina xizmetên zagonî pêşkêş navenda pêşwazîyê diken, rabêja zagonî werbigirin. Bo bidest xistina agahîyên bêtir liser rabêja zagonî, gel endamên navenda pêşwazîyê pêwendîyê bigirin.

Zanyariyên peywendîya Rêxistna Navnetewîya Koçberîyê (IOM)

IOM Helsinki
Unioninkatu 13, qata 6 é
PL 851, 00101 Helsinki
+358 9 684 1150
iomhelsinkiavr@iom.int
www.iom.fi

Eger hn dixwazin xwebexşane wegerrine welatê xwe, ji navenda pêşwazîyê rabêjê werbigirin.

Nêziktirîn nivsîngeha heremî ya Komîsyona Bilinda Penaberan ya Neteweyê yekbûyî

UNHCR
Ynglingagatan 14, 6 tr
SE-113 47 Stockholm
Sweden
Telefon. +46 8 457 48 80
swest@unhcr.org



Rajavartiolaitos
Gränsbevakningsväsendet
The Finnish Border Guard